Nameya Şaredarê SUR ê Demirbaş ji bo CHAK ê

Îro nameya şaredarê SUR a Amed ê Abdullah Demirbaş gihişte navenda CHAK ê. Em nameya Demirbaş bi we re pay dikin:

"Birêz rêveberên CHAK'ê

Di destpêkê de ez spasiyên xwe yên bê sînor ji we û hemû endamên saziya we re pêşkêş dikim ji bo têkildarî û xebatên we yê ronîkirina rewşa nexweşiya min ji saziyên pêwendîdar re. Ez wê ked û xebata we bi dilekî germ pîroz dikim û malavaya we dikim her wiha serkeftinê di hemû kar û xebatê we yê mirovahî de hêvî dikim.

Xuşk û birayên hêja

Kar û barê ku we daye ser milê xwe karekî zor û zehmete lê di heman demê de karekî girîng û pîroz e ji bo ronîkirina rewşa kurdan û binpêkirinên mafê mirovan ên ku welatê me diqewime. Tiştê ku dihêle hûn wê ked û westandina xwe jibîr bikim jî ew e ku dema karek ji van karên we bi ser dikeve û rewşeke çewt a binpêkirina mafan sererast dibe ew bi xwe jî Kêfxweşiya herî mezin e .

Hewcedariya gelê me bi sazî û rêxistinên ku wiha ji dil xebatê dikin heye da ku haya cîhanê ji vê zilm û zora li gelê me tê kirin çêbibe û pireke ji têkiliyên sererastkirî di nava gelê kurd û gelê cîhanê de çêbibe.

Dîsa serkeftin ji we re di hemû kar û xebatên we yê pîroz de. 26 gulan 2010

Abdullah Demirbaş
Şaredarê Sur a Diyarbekir"

CHAK-Navenda Dokumentasyonê – EuroKurd News